LIDA Stories

lidastories.net

Zilamekî kal wekî mêr / Un vieil homme comme mari

Aranya

Sunniva Høiby-Øiset

Hebûn Stembar (kmr), Zina (fr)

This work is licensed under a Creative Commons Attribution 4.0 International License.

https://creativecommons.org/licenses/by/4.0

Zilamekî kal wekî mêr

Un vieil homme comme mari

Aranya

Sunniva Høiby-Øiset

Hebûn Stembar

5

کورمانجی kmr / français fr

Min digot qey mêrên Norwêcî zilamên herî baş ên cîhanê ne, lê ew ne rast e! Berî ku ez wî zilamê ku bû mêrê min nas bikim, ez li Bangkokê di kargehekê de dixebitim, û ew li Pattaya dijiya. Me bi rêya Înternetê hev nas kir û di dawiyê de bûn cotek.

. . .

Je pensais que les hommes norvégiens étaient les meilleurs hommes au monde, mais cela n’est pas vrai ! Avant de rencontrer l’homme qui est devenu mon mari, je travaillais dans une usine à Bangkok, et il vivait à Pattaya. On s’est rencontrés sur internet et on s’est finalement mis en couple.

Piştî demekê me biryar da ku em bizewicin. Ez ji malbateke feqîr hatim, lema jî hebûna mêrekî biyanî yê ku bikaribe debara malbata min bike, bû parekî sedema ku ez bi wî re bizewicim.

. . .

Après un moment, on a décidé de se marier. Je viens d'une famille pauvre, donc avoir un mari étranger qui pourrait prendre soin de ma famille était l'une des raisons de mon mariage.

Em koçî Norwêcê kirin, û min dest bi dibistanê kir ku ez Norwêcî hîn bibim. Demek dijwar bû. Ehliyeta min tune bû, mêrê min mecbûr ma bi ajotina min bibira dibistanê, li benda min bisekine û vegere. Ji her alî ve saetek bû. Piştî demekê em nêzîkî hev bûn, lê wî dîsa jî israr kir ku min bi ajotina dibistanê. Wî nedixwest ku ez bi tenê bimeşim.

. . .

Nous avons déménagé en Norvège, et j'ai commencé à aller à l'école pour apprendre le Norvégien. C'était des temps difficiles. Je n'avais pas mon permis de conduire, et mon mari devait me conduire à l'école, m'attendre, et rentrer en voiture. Cela faisait une heure de trajet. Au bout d'un moment, nous avons emménagé plus près, mais il insistait toujours pour me conduire à l'école. Il ne voulait pas que je marche seule.

Nizanim paşeroj wê çi bi xwe re bîne. Plana min ew e ku ez biçim dibistanek din, lê mêrê min naxwaze ku ez wiya bikim. Ew plan dike ku dûrtir biçe da ku karê min tevlihev bike. Ez dixwazim li ber xwe bidim lê nizanim çawa. Jiyana li welatekî din bi mêrekî pîr re ji ya ku min texmîn dikir dijwartir e.

. . .

Je ne sais pas ce que l'avenir a en réserve. Mon objectif est d'aller dans une autre école, mais mon mari ne veut pas que je le fasse. Il prévoit de déménager plus loin pour que cela soit dur pour moi. Je veux résister, mais je ne sais pas comment. Vivre dans un pays étranger avec un vieil homme comme mari n'est pas aussi facile que ce que je pensais.

Ji dema ku ez hatim Norwêcê hema hema tu pereyê min nemabû. Mêrê min carekê ji bo firavînê pere da min, lê ji ber ku pereyê min pir hindik bû min ew parast. Hevalên min ên li dibistanê dixwazin ji min re bibin alîkar ku karekî peyda bikim. Mêrê min, min ji bo karê paqijiyê minasib nabîne.

. . .

Je n'avais que très peu d'argent depuis que j'étais venue en Norvège. Une fois, mon mari m'a donné de l'argent pour le déjeuner, mais puisque je n'avais pas d'argent, je l'ai gardé. Mes amis à l'école veulent m'aider à trouver du travail, mais mon mari dit que je ne peux pas. Il pense que travailler comme femme de ménage n'est pas convenable pour moi.

Li şûna wî karekî din ji min re hebû – çêkirina garajê. Ew serkar bû û min her tişt kir. Ji ber ku nexweş bû, nikaribû pir tişt bike. Ji çêkirina garajê pere stend, lê neda min.

. . .

À la place, il avait un autre travail pour moi — construire un garage. Il était le patron et je faisais tout. Il ne pouvait pas faire grand-chose car il était malade. Il ne m'a rien donné de l'argent qu'il a gagné en construisant le garage.

Rojekê gava ew li malê tenê bû, wî got ku ew bêzar bûye û biryar da ku em kûçikek bistînin. Min kûçikek nedixwest ji ber ku ez piştî dibistanê westiyam û karê malê hebû. Wî got ku ewê her roj bi kûçikê bimeşe, lê di dawiyê de ez neçar bûm ku hem kûçik û hem jî mêrê xwe yê pîr biparêzim.

. . .

Un jour, il a dit qu'il s'ennuyait quand il était seul à la maison, donc il a décidé qu'on devrait avoir un chien. Je ne voulais pas de chien puisque j'étais fatiguée après l'école et que j'avais des devoirs à faire. Il a dit qu'il l'emmènerait en balade tous les jours, mais finalement, j'ai dû m'occuper à la fois du chien et de mon vieux mari.